BI :RêBERNAMEYî PLANA GûNCANDIN:

# Agahî derbarê bernameyê gûncavdinê bo ew kesên ku beşdarî bernameyê întroyê bibin.

## Derbarê planê we yê gûncandin

Divê hûn û şaredarî bi hev re hevkarî bikin ku ji bo beşdarî yê we bo bernameya întroyê çêbikin. Beşdariya we di bernameya întroyê de dê bibe alîkar ku hûn baştir Norwêcî yê ferbin, agahî ser civaka Norwêcî, bawernameyên fermî û têkiliyek mayînde ya bi jiyana kar re ferbin. Armanc ev e ku hûn di gava destpêkê de têkevin nav civaka Norwêcî bigûncin û ji hêla aborî ve ji serbixwe bibin.

## Tesbît kirinê jehatî û vesfê te

Berî ku plane we ya gûncandinê were amade kirin, maf û erka we heye ku hûn tesbît kirinê vesfê we yê jêhatîbûnê pêk were. Di tesbîtê de divê herî kêm tê de çi zanistiyê we ser ziman û çi perwerde, ezmûna kar û vesfê we ya têkildar heye were beyan kirin.

**Rênîşandanê karîyerê**

Maf û erkê we heye ku hûn ji rêberiya karîyera xwe temam bikin.
Rêberîyê karîyera dê agahdariya hildin û ev agadarî rê nîşan bike ku hûn plansaziyek ji bo kar û xwendinê çêbikin

## Naverokê bernameyê we yê gûncandin

- Naverokê nexşeya gûncandinê,entegrasyonê divê armanca weya paşîn û zimanê Norwêcî, planekî ji bo perwerdeyê, gelo heya kengî hûn dikarin beşdarî bernameyê bibin û îmkanên we yên îtirazê çîye zelal bike
- . Nexşeya we divê li ser bingeha tesbît kirinê perwerdehiya we, ezmûna (tecrubêyê) kar, vesfê we bi têkildarî jiyana karê û agahdariyên din ên grîngê têkildar be.

Bernameyê introyê(gûncandin) divê herî kêm bi ew maddeyan pêk were:
a) perwerdeyê norwêcî
b) perwerdeyê li zanistîyê civakî
c) devreyek bo ferbûnê jiyanê
d) tedbîrên yên ku bo kar yan xwandin peyda bike.
Beşdarên ku zarokê bin18 salî heye divê beşdarî kursê rênîşandanê bo dêûbav bin.
Bernameyê gûncandin hemû salê û bi berdewamîye.

## Armancê te yê dawî

- Divê şaredarî ji bo beşdarbûna we di bernameya gûncandinê de armancek dawîn nîşan bike. Armanca dawîn, di nav tiştên din de, li ser bingeha kîjan perwerdehiya ku we berê jî heye, tê diyar kirin.

## Armancê norwêcî

- Divê beşdaran di perwerdehiya zimanê Norwêcî de di  astek herî kêm bi dest bixin. Divê şaredarî û şaredariya wîlayetê perwerdehiyê saz bikin da ku beşdaran bikarin asta herî kêm dest bixin.
- **‒Şopandin û nirxandina plana te ya gûncandinê**
- Di dema perwerdeyê de, şaredarî dê bi we re li ser bernameyê we ya gûncandinê de şore bike ka çawa diçe. Heger hûn nexşerê ya xwe ya gûncandinê neşopînin, an jî hûn bixwazin pilana xwe biguherînin, divê hûn zûtirîn wext bi kesê ku berpirsîyarê we ye re têkilî daynin.

- **Gelo hûn dixwazin ji plana xwe ya gûncandinê re gilî bikin?**

Hûn dikarin gilî bikin bo her bo perverde û naverokê planê gûncandinê xhe

## Heger bixwazî gilî bikî, divê hûn:

- Ji demê sitandina biryarê ve nav sê hefteyan de divê li ser naveroka planê xwe ya gûncavdinê gilî bikin

- Giliyê xwe bidin bo daîreyê ê şaredariyê ku biryar li ser nexşeya we ya gûncavdinê
- SBinîvîse ka hûn li ser çi gilî
- Divê hûn gilîname yê îmze bikin

Parêzerek jî dikare li ser navê we gilî bike. Ji bo ku kesek wekî nûnerê we hereket bike û gilînameyek ji bo we binivîse, divê hûn vekaletekî nivîskî ji wî/wê kesî re dabûya. Pêdivî ye ku vekaletê çi parêzerê we dikare li ser navê we bike penase bike. Heger parêzerekî we hebe, vekaletname  ne hewce ye.

**Gelo hûn dikarin li ku derê zêdetir agahdarî li ser plana gûncandinê bibînin?**

Zêdetir agahdarî li ser nexşeya entegrasyonê Di yasayê gûncavbûnê de têne dîtin. Zagon,qanûn bi fermanê li ser www.imdi.no û li ser malpera kompetanse Norge nettsider têne dîtin.

Mer informasjon om integreringsplan kan du finne i integreringsloven. Loven med rundskriv finner du på [www.imdi.no](www.imdi.no) og på [Kompetanse Norge nettsider](Kompetanse Norge nettsider).

Serqeftin bi perverdeyê!